Daxuyaniya Komîteya Bilind a Pêşwazîkirina Ziyaretvanên Çilê Îmam Husên

Bi Boneya Bidawîhatina Pêvajoyê di Sala 2025an de

Bi navê Komîteya Bilind a Pêşwazîkirina Ziyaretvanên Çilê Îmam Husên, roja Yekşemê, 17.08.2025, bidawîhatina pêvajoya merasîma pêşwazîkirina ziyaretvanên Îranî û biyanî yên Çilê Îmam Husên ji bo bajarên pîroz Kerbela û Necefê ji bo sala 2025an radigihînin.

Li ser biryara Hikûmeta Herêma Kurdistanê û piştî derketina fermana îdarî ya parêzgeha Hewlêrê di 28.05.2025an de, Komîteya Bilind bi endametiya hemû wezaret û aliyên peywendîdar, ji bo pêşkêşkirina xizmetên giştî di warê ewlehî, tenduristî, veguhestinê, cihê mayînê û bêhnvedanê bi hemû pêwîstiyan re ji bo birêveçûna merasîma Çileya Îmam Husên ji bo sala 2025an, ji bo pêşwazîkirina ziyaretvanên Îranî û biyanî, dest bi amadekariyan kir.

- Rêxistinkirin û damezrandina çar rawestgehên mayînê, bêhnvedan û pêşwazîkirina ziyaretvanan li (Derwazeya Navneteweyî ya Hacî Omeran, Kanî Maran, Pêşangeha Navneteweyî ya Hewlêrê, Kontrolgeha Şîraweyê).
- Dabînkirina pêwîstiyên her çar stasyonan ji aliyê (Dezgeha Xêrxwazî ya Barzanî) ve bi hemû pêwîstiyên lojîstîkî re, wek kelûpel, amûr, alav, kabîne, ambûlans, derman, xwarin, ava vexwarinê, çay, û selikên xwarinê (şerbet, av, kek û bîskûvît), û sarincok, av, kempên sîber, înternet û pêwîstiyên mayîna ziyaretvanan wek betanî, doşek, balgîf, nivîn, kon, tankên avê, tuwaletên gerok, sarincok, amêrên hinikker, berik, kursî, mase, hewzên ava sar, selexane û kabîn û termûsên avê û konteynir û qeşa û hwd.
- Dabînkirina heqê kirêya otobusan ji bo veguhestina hatin û çûyîna ziyaretvanan ji aliyê (Serokayetiya Herêma Kurdistanê) ve, ji Hacî Omeran bo Hewlêrê û dîsa ji Hewlêrê bo Hacî Omeran, herwiha kirêya veguhestina beşek ji ziyaretvanan ji Hewlêrê bo Necef û Kerbelayê û dîsa vegera wan bo Hewlêrê.
- Bicihkirina tîm û komîteyên dezgehên peywendîdar li gorî pîsporiya erkên wan bi karmendên pispor û karîger, bi şev û roj di van dezgehên jêrîn de: (Dezgeha Xêrxwazî ya Barzanî - Fermangeha Peywendiyên Derve û Karûbarên Îranê - Navenda Hemahengiyê ya Qeyranan - Derwazeya Navneteweyî ya Hacî Omeran - Veguhestin - Asayîş - Polîs - Pasaport - Polîsê Gumrikê - Asayîşa Kontrolgehan - Têkoşîna li dijî Maddeyên Hişbir - Polîsê Çalakiyên Sivîl - Gumrik - Polîsê Trafîkê - Pasewanên Sînor - Tenduristî - Parastina Sivîl - Geştyarî - Şaredarî - Parastina Jîngehê).
- Avakirina komîteyên hevbeş ên hawarhatinê (Asayîş - Polîs - Trafîk - Parastina Sivîl - Tenduristî) li sînorê hemû qaymeqamiyetan û rêveberiyên nahiyeyên li ser rêyên hatinûçûna ziyaretvanan.
- Amadebaşiya hemû nexweşxane û navendên tenduristiyê yên li ser rêya hatinûçûna ziyaretvanan.

- Danîna gelek stasyonên veguhestinê yên gerok li ser rêya sereke ya ziyaretvanan ji derwazeya Hacî Omeran heta Kerbelayê, ku ji gelek otobusên vala û tîmên nivîsîngehên navxweyî pêk dihatin.

- Amadebaşiya tîmeke firokeyî ya Rêveberiya Trafîkê ya Hewlêrê ji bo dema pêwîst û hemahengiya wan bi tîmên din ên dezgehên peywendîdar re.

- Danîna (57) komputera pasaportê li Derwazeya Hacî Omeran ji bo bilezkirina kar û hatinûçûna pasaportên ziyaretvanan.

- Amadekirina (3.300) otobus, koster, raf û otobus ji bo veguhestina ziyaretvanan ji aliyê Rêveberiya Veguhestinê ya Parêzgeha Hewlêrê û Rêveberiya Serbixwe ya Soranê ve û çavdêrî û rêberiya wan bi hemahengî bi nivîsîngehên veguhestinê yên navxweyî re ji Derwazeya Navneteweyî ya Hacî Omeran heta Kerbelayê di du qonaxan de û dîsa vegera wan.

- Bicihkirina gelek amûr, alav, otomobîlên hawarhatinê, otomobîlên agirkujiyê, ambûlans, kren, tankerên ava vexwarinê, tankerên ava giran, amûrên paqijkirina kebs û qalib û sarkerên dermanan û sarkerên xwarinê û mînîbus û traktor û rafîe û loriyên barkêş û otomobîlên mîkrezemînî û pîkap û otomobîlên dezgehên ewlehî yên aliyên peywendîdar û Dezgeha Xêrxwazî ya Barzanî li hemû rawestgehên bêhnvedanê û li ser rêyan, ji bo alîkarîkirin û gihîştina hewara ziyaretvanan.

Pêvajoya hatina ziyaretvanan bi awayekî fermî di 30.07.2025an de dest pê kir û di 17.08.2025an de bi awayê jêrîn bi dawî hat:

- Zêdetirî (137.000) ziyaretvan bi rêya Derwazeya Navneteweyî ya Hacî Omeran serdana Necef û Kerbelayê kirin, ku ji bilî ziyaretvanên Îranî, ziyaretvanên welatên din jî, wekî welatên (Tirkiye - Azerbaycan - Gurcistan - Rûsya) hatinûçûnê kirine.

- Hejmara nexweşên ku ji ber nexweşiyê ji bo wergirtina çareseriya bijîşkî serdana navend û tîmên tenduristiyê yên li her çar rawestgehan kiribûn, zêdetirî (2.862) nexweş bûn.

- Bi bextewarî, ti qezayên trafîkê û bûyerên parastina sivîl nebûn.

- Di encama van hemû xizmetguzariyên ku Serokayetiya Herêma Kurdistanê û Hikûmeta Herêma Kurdistanê û Dezgeha Xêrxwazî ya Barzanî û Komîteya Bilind û tîm û komîteyên stasyonan, îsal pêşkêşî ziyaretvanên Îranî û biyanî kirin, hemû ziyaretvan di nav atmosfereke aram û ewle de û bi rêzdarî û bi ruhekî Kurdewarî û mirovhezî ji aliyê hikûmet û gelê Kurdistanê ve hatin pêşwazîkirin û hemûyan bi aramî beşdarî merasîma Çilê Îmam Husên li bajarên pîroz Necef û Kerbelayê kirin û paşê bi saxlemî vegeriyan welatên xwe û ji Xwedayê mezin daxwaz dikin ku dua û nimêj û îbadetên wan qebûl kiribin.

- Hemû endamên Komîteya Bilind û rêveber û berpirsên navendan û serokên komîteyan û tîm û hemû karmend û xebatkar û karkerên ku li her çar stasyonan û li ser rêya hatinûçûna ziyaretvanan hatibûn bicihkirin, di vê demê de bi şev û roj bêwestan û bi dilsozî hemû planên xizmetguzariya gişt û erkên xwe yên li ser milê wan cîbicî kirin, ku bû sedema bidawîhatina bi serkeftî ya pêvajoya hatina ziyaretvanên Çileya Îmam Husên, ku em ji dil spasiya her yek ji wan dikin.

- Hemû endam û karmend û xebatkarên (Dezgeha Xêrxwazî ya Barzanî) bi awayekî pir profesyonel û mirovhez û xêrxwaz û Kurdewarî ji bo çaremîn sal e ku bi erkê mirovahî û xêrxwaziya xwe rabûn di dabînkirin û pêşkêşkirina hemû xizmetên giştî û lojîstîkî de li her çar stasyonên mayîn û bêhnvedana ziyaretvanan, ku bi şev û roj û bi awayekî (24) demjimêrî di erkê de bûn, her ji roja yekemîn a pêvajoyê heta bidawîhatina pêvajoyê bi me re bûn û piraniya erkên hikûmetê li ser milê wan bû. Ji ber vê yekê em ji dil spasiyên bêdawî pêşkêşî serok û cîgir û karmendên wan yek bi yek dikin.

Ji ber vê yekê, bi bidawîhatina serkeftî ya pêvajoyê, li vir pêwîst e ku em spasiyên xwe yên bêdawî pêşkêşî van rêzdaran û aliyên jêrîn bikin ku bi her awayî piştgiriya Komîteya Bilind kirin da ku bi awayê herî baş karibin erkên xwe bicîh bînin ji bo serkeftina pêvajoya pêşwazîkirina ziyaretvanên Çileya Îmam Husên ji bo sala (2025):

- Serokayetiya Herêma Kurdistanê
- Serokayetiya Encûmena Wezîran
- Dezgeha Xêrxwazî ya Barzanî
- Wezareta Navxweyî
- Parêzgeha Hewlêrê
- Îdareya Serbixwe a Soranê
- Yekîneyên Îdarî û hemû dezgehên peywendîdar û desteyên din
- Konsulxaneya Komara Îslamî ya Îranê li Hewlêrê
- Nûneratiya Hikûmeta Herêma Kurdistanê li Bexdayê
- Pêşangeha Navneteweyî ya Hewlêrê
- Nivîsîngehên Veguhestinê yên Navxweyî û birayên şofêrên otobusan
- Heya Sor a Iraqî û Heyva Sor a Îranî û saziyên xêrxwazî yên Îranî û rêxistin û şîrketên xêrxwazî yên din.

Û di dawiyê de em ji dil spasiya gelê şeref û dilsoz ê Herêma Kurdistanê dikin ku îsal jî dîsa wek salên borî bi ruhekî biratî û mirovahî û bi dilgermî pêşwaziya ziyaretvanan kirin û rûyê rastîn ê gelê Kurdistanê nîşan dan û dîrokeke din a mirovahiyê di vê boneya olî ya pîroz de tomar kirin.

Ragihandina Komîteya Bilind a Pêşwazîkirina Ziyaretvanên Çileya Îmam Husên

18.08.2025